KONGRA-GEL: Ne tenê Tirkiye wê kurd jî bikevin YE'yê

ROJ TV - KONGRA-GEL, berî rapora li ser endamtiya Tirkiyê ya komîsyona Yekîtiya Ewrûpa ya ku wê dı 6ê cotmehê de were eşkerekirin, bal kişand ser pirsgirêka Kurd. Komîteya Têkîliyên Derve ya KONGRA-GEL, bi belgeyekê de cîh da daxwazên berçav ên gelê kurd û xwest ev yek di Destûra Bingehîn de cîh bigirin. KONGRA-GEL destnîşan kir, daxwazên 40 milyon gelê kurd, nabe ku were paşçavkirin û got, „Ne tenê Tirkiye, gelê Kurd jî ê bikeve Yekîtiya Ewrûpayê.

Komîteya Têkîliyên Derve ya KONGRA GEL, bi navê „Ji bo Kurdan Yekîtiya Ewrûpayê û Tirkiye“ belgeyek weşand û di endamtiya Tirkiye de, hêviyên gelê kurd destnîşan kirin.

KONGRA GEL, di belgeyê de cîh da pêşniyarên aştiyane û weke belgeyekê şand ji bo Komîsyona Ewrûpayê, Serokê Parlamena Ewrûpayê Josep Borrell, Komîserê Ji Berfirehkirina Yekîtiya Ewrûpayê Berpirsyar Gunter Verheugen, parlamenên Parlamena Ewrûpayê û serok dewletên welatên endamê Yekîtiya Ewrûpayê.

Di belgeyê de KONGRA GEL destnîşan dike ku ew li dijî pêvajoya endamtiyê nînin, lê belê heger Tirkiye beyî ku hebûna gelê kurd, nasname û çanda wî di Destûra Bingehîn de bi ewle bike, bibe endama yekîtiyê, ev ê were wateya dewama polîtîkaya îmha û înkarê.

KONGRA GEL ji YE'yê re daxwa-zên Gelê Kurd pêşkêş kirin

Komîsyona Têkîliyên Derve ya KONGRA GEL di belgeyê de ji bo polîtîkaya neçareserî û xitimandinê were rakirin, daxwazên gelê kurd wiha rêz kirin:

–Ji bo pirsgirêka kurd bi aştiyeke berdewamî were çareserkirin û Tirkiye pîvanên Kopenhagê bi cîh bîne, divê komîsyoneke navendî ku kurd jî tê de cîh bigirin, were sazkirin. Divê komîsyona mijara gotinê bi kurdan re bikeve diyalogê û di navbera Tirkiye-Yekîtiya Ewrûpayê û kurdan de têkîliyê deyne.

–Ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd, divê„planeka acîl a çalakiyê' were amadekirin û derbasî pratîkê bibe.

–Divê di navbera kurd û tirkan de pêvajoya agirbesta dualî were destpêkirin û di vê de Yekîtiya Ewrûpayê li gorî prensîba bêalîbûnê, rola navbeynkariyê bilîze.

– Ji bo agirbesteke dualî divê operasyonên artêşa Tirk werin rawestandin û li herêmê leşkerên fuzûlî tunebin.

–Li hemû sazî û dezgehan divê Qanûnên Rewşa Awerte OHALê werin rakirin û sîstema cer-devaniyê were rakirin.

–Di serî de Serokê gelê kurd Abdullah Ocalan, divê afûyeke giştî ku hemû girtiyên siyasî bide ber xwe, were îlankirin.

–Ji bo gundên hatine valakirin û şewitandin wer-in avakirin û ziyanên kesên bi darê zorê koçber bûne, tazmînat were dayîn û ji bo vegera gundan derfet werin pêşxistin.

–Ji bo di qanûnan de nasnameya kurd were naski-rin û çand û zimanê kurd pêş bikeve, pêwîst e derfet were dayîn û gelê kurd jî bibe xwedî hemû mafên ku gelê tirk xwedî ye.

–Ji bo pêşxistina çand, ziman, dîrok û muzîka kurdî divê navend werin sazkirin.

–Hemû navên cografî û navendên wargehan ku di encama polîtîkaya asîmîlasyonê de hatine guhertin, divê ji nû ve bibin kurdî.

–Ji bo herêmên Kurdan werin pêşdebirin, planeke aborî û civakî derbasî pratîkê bibe.

– Divê qedexe û astengiyên li ser rêxistinên kurd bi gîştî werin rakirin û ji bo bi awayekî serbest siyasetê bikin, derfet werin dayîn.

–Divê li gorî biryarên Parlamena Ewrûpa û Komîsyona Ewrûpayê yên derbarê pirsgirêka kurd de gav bên avêtin.

– Ji bo bi awayekî rast pirçandîtî pêşbikeve, divê reform di pratîkê de bi cîh werin.

–Ji bo netewe û hindikahiyên din bi awayekî hêsan mafên xwe bi kar bînin, divê derfet bên dayîn.

(Ji malpera KOGRA-GEL hatiye wergirtin)